Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar :1294 · 30-Tîrmeh-2025 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Armanc ji fîlm ragihandina êş û zehmetiyên koçberiyê ye’

Hêvî Keleş/ Qamişlo


**Derhêner Nadiya Derwîş destnîşan kir ku wan ji 23 meha pûşberê de dest bi kişandina fîlmê li ser koçberiya malbateke ji bajarê Serêkaniyê û jiyankirina wan li bajarê Qamişlo kirine û got: “Armanca me ji fîlm ragihandina êşa koçberiyê û bi taybet zehmetiyên ku jin û zarok di şer û koçberiyê dikşînin.”**

Komîna Fîlma a Rojava di 23 meha pûşberê de dest bi kêşana filmekî kirin ku fîlm li ser çîroka malbatek ji serêkaniyê ye piştî şer û koçberiyê li bajarê Qamişlo bicih bûne û di fîlm de behsa zehmetiyên ku bi wan re derketine tê kirin, bi taybet li ser jin û zarokên ku di şer û koçberiyê de zehmetiyê dibînin. Derbarê çêkirina fîlmê li ser malbata koçber a ji bajarê Serêkaniyê, derhênera Fîlm Nadiya Derwîş ji Rojnameya me re axivî.



## ‘Di 23 meha pûşberê de me dest bi kêşana film kir’

Derhêner Nadiya Derwîş anî ziman ku wan dest bi çêkirina fîlmekî nû kiriye û wiha got: “Ev sê salin sînariyo dihate hazirkirin û di vê salê de jî, di meha Adarê de me dest bi hazirtiyên Fîlm kir û di 23 meha pûşberê de me dest bi kêşana fîlm kir. Wê fîlm di meha 9’an de bê weşandin. Di vî fîlmê de me xwestiye balê bêhtir bikşînin li ser jin û zarokan, yek jê rewşa jin di nava şer de û zehmetiyên ku dikşînin. Fîlmê me çîroka malbatek ji Serêkaniyê ye ku piştî şer û koçberiyê li bajarê Qamişlo bicih bûne û li vir bê çi zehmetî bi wan re derdikevin, di heman demê de di nava şoreşa Rojava bi taybet weke saziyên jin yên ku ji aliyê jinan ve hatibûn vekirin, xebatên wan çawa hatine meşandin û piştgiriya jinan ji hev re ku çawa hêz didin jinê li gel xwe  û çawa hevaltiya hev dikin, herwiha çawa xwedî li jin û zarokan derdikivin. Ev esasê mijara fîlmê me ye.”



## ‘Em ê balê dikşînin ser jiyankirina bi hev re û hevaltiyê tevî zehmetiyan’

Nadiya Derwîş destnîşan kir ku fîlm balê dikşîne ser pirnetewiya li bajrê Qamişlo, tevî vê pirnetwiyê hezkirina gel ji hev re heye û wiha got: “Tevî zehmetiyan bi hev re jiyankirin û hevkarî û hevaltî di nava gel de heye, di fîlm de jî bal li ser tê kişandin. Ev malbata Kurd ku ji Serêkaniyê koçberî Qamişlo bûne, derdixînin ji gel re ku çawa jinên li vir xwedî li wan dirdikevin û çawa ku pêkhateyên li vir weke Suryan, Ereb û Kurd alîkariya vê malbatê dikin, bi taybet alîkariya jinê û zarokê wê dikin. Û li kêleka wê jî di fîlm de hin xalin din hene ku dema fîlm bê weşandin wê bi we re bên xuyakirin weke şîdeta ku li jinê tê kirin û çawa ku jinek karibe li ser lingên xwe bisekine bi hêza xwe û bi xwe bawer bike, herwiha li ser zarokekê ku ji ber rewşa ku jiyan dike nikare weke zarokekî jiyana xwe bike.” Derhêner Nadiya Derwîş axaftina xwe wiha qedand: “Armanca ji çîroka fîlm diyar e, ku çawa jin tevî zehmetiyan ji hêza xwe bawer be û karibin li ser lingên xwe bisekine, herwiha çawa jin xwedî li hev derkevin. Em çawa hemû pêkhate bi hev re jiyan bikin, heta lîstikvanên fîlmê me ji hemû pêkhateyan e; suryan, ereb û kurdin. Çi tiştên di fîlm de çêdibin di jiyana me jî de çêdibe, ji ber wê jî em di fîlm de derdixînin. Di çkirina me ji vî fîlmî re hin zehmetî bi me re derdikevin, yek jê niha em di werzê havînê de ne û kêşana fîlmekî di havînê de pir zehmet e ji ber germahiya zêde zerarê carinan li teknîkê dike, herwiha me behs kir ku di neveroka çîroka fîlm li ser saziyê jinan û piştgiriya wan ji hev re, pir sazî bi me re bûn alîkar û hinek jî nebûn alîkar, ev jî mijara rexnê ye, hêviya me ew e ku gel û sazî bi me re bibin alîkar ji ber kişandina filmekî li bajarekî tijî qerebalix zehmet.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER DESTHILATIYÊ**

**Bila her kes di bin rima min re derbas bibe:**
- Bila her kes mezinayiya min bipejirîne; bila her kes xulamtiyê ji min re bike.

**Bila her kes li bin şûrê min kom bibe:**
- Bi heman wateyê.

**Destê ti kesî li newqa dewletê nagihe hev:**
- Hêza ti kesî nagihe hêza dewletê; ti kes bi dewletê nikare; dewlet pir bihêz e.

**Dewlet kêrvoşkê bi erbanê digire:**
- Kesê serdest serî li her tiştî dide; derewan dike, dixapîne, durûtiyê dike.

**Di destê wî de y/di destî de ye:**
- Ew dizane; esil ew e; biryar ya wî ye.

**Her kes di bin şûrê wî re derbas dibe:**
- Desthilatdar e; her tişt bi fermana wî dibe; ti kes nikare bê wî tiştekî bike.

**Kurt û dirêj di destê min de ye:**
- Ez desthilat im; ez çi bêjim wisa ye.

**LI SER QEDANDINÊ**

**Binê wê da bayê:**
- Tiştek tê de nehişt; qedand; binê wê paqij kir.

Ji destê xwe derxist/ji destê xwe **deranî:**
- Qedand.

**Me ker gurand ma poçik:**
- Me karê xwe yê giran kir, ma yê sivik.

**Me ker gurand gihat poçik:**
- Bi heman wateyê.

**Piştî ku kerê xwe ji avê derbas kir:**
- Piştî ku karê xwe qedand; piştî ku pêwîstiya wî nema.

**LI SER BINDESTIYÊ**

**Berderiya wî dike:**
- Ji gotina wî dernakeve; di binê desthilatdariya wî de ye.

**Bindariya wî dike:**
- Bi heman wateyê.

**Di binê siya wî de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Nikare beje ez kafir im, yan misliman im:**
- Di binê zordestiyeke mezin de ye.

**Serê xwe jê re tewand/serê xwe jê re çemand:**
- Bindestiya wî qebûl kir; neheqî qebûl kir; teslîm bû; mezinayiya wî ji xwe re qebûl kir.

Serê xwe jê re danî:
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi kamîreya Ayşa Silêman



## ‘Armanca me avakirina civakeke demokratîk û azad e’



Rêveberiya Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl diyar kir ku kar û xebatên wan zêdetir xwe di avakirina civakeke demokratîk, exlaqî û wekhevî di navbera jin û mêr de tên meşandin û got, “Armanca me avakirina civakeke demokratîk û azad e."**R-2**

## Xwendina Tezên Rêber Apo; pêşxistina asoyên ciwanên serdemê ye



Xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan li Rojavayê Kurdistanê bûye çandek û bi awayekî sîstematîk tên xwendin. Bi pêşengtiya ciwanên Kurd bi navê Tezên Rêber Apo perwerde tê dîtin û şopeke bi bandor di keseyeta wan de ava kiriye.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1294 · 30-Tîrmeh-2025 · www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

## ‘Bidawîkirina destwerdana Tirkiyê, bidawîkirina kirîza Sûriyê ye’




Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed destnîşan kir ku dewleta Tirk Sûriyeke demokratîk naxwaze, destwerdana dewleta Tirk li Sûriyê hişt ku kirîz dirêjtir bibe û got, “Eger destwerdana dewleta Tirk bi dawî bibe wê pirsgirêka Sûriyê jî çareser bibe."**R-5**

# RÊVEBERIYA XWESER HÎMÊ YEKGIRTINA GELAN E

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka avabûnê ve û heta îro destekdayîna hemû pêkhateyên Sûriyê dike. Tevî êriş, dorpêç û siyasetên ku li dijî Rêveberiya Xweser tên meşandin, ew herdem bi erkê xwe yê mirovî radibe û li gorî derfetan alîkariyê pêşkêş dike. Rêveberiya Xweser bi hembêzkirina pêkhateyên Sûriyê hîmê yekgirtina gelan ava kiriye.**R-3**









## Sînemagerî û derhênerî ji bo Yilmaz Elî xewnek bû



Derhêner Yilmaz Elî diyar kir ku ji zaroktiyê ve sînemagerî û lîstikvaniyê şopên xwe di jiyana wî de çêkirine û wî heta roja îro ev rê bi hezkirin berdewam kiriye.**R-7**

## ‘Armanca hikumeta veguhêz a Şamê parçekirina pêkhateyên Sûriyê ye’



Edîtorê Beşa Erebî ya Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) Ehmed Mihemed destnîşan kir ku hikumeta veguhêz a Şamê bi aramnca yekrengbûna xwe li ser pêkhatiyên li herêmê feriz bike, komkujiyan li dijî gel û pêkhateyên Sûriyê pêk tîne.**R-4**

**Li Sûriyê kî çi dixwaze?**
Zekî Bedran R-5



**Li hember Rojava dijminatiya dîrokî**
Farûk Sakik R-5

# ‘Armanca me avakirina civakeke demokratîk û azad e’

**Rêveberiya Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl diyar kir ku kar û xebatên wan zêdetir xwe di avakirina civakeke demokratîk, exlaqî û wekhevî di navbera jin û mêr de tên meşandin û got, “Armanca me avakirina civakeke demokratîk û azad e.”**

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Desteya Jin di 21’ê çileya sala 2014’an de bi ragihandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk re hate avakirin. Desteyeke fermî ye ku têkildarî pirsgirêkên jinan ên civakî, aborî, çandê, siyasî û hiqûqî ye. Têgeha Neteweya Demokratîk di xebata xwe de esas digire û ji bo xurtkirina peransîba edaleta civakî û bidestxistina cihêkariyê dixebite, di berjewendiya jinê de erênî ye û têgehên paşverû yên ku pêşketina civakê asteng dikin ji holê radike, da ku bighêje civakeke demokratîk, zayendî, ekolojî û azad e. Li gorî vê yekê di hemû qadê têkildarî jinan de pilansaziyên pêşketina strajîk çêdike, mafên wan diparêze û di hemû saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de destekê dide qanûnên ku jinan eleqdar dikin.

Di derbarê kar û xebatên Desteya Jin a kantona Cizîrê yên sala 2025’an de Rêveberiya Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl ji Rojnameya me re axivî.



### Kar û xebatên Desteya Jin

Rohat Xelîl di destpêka axaftina xwe de wiha got: “ Desteya jin yekemîn desteya di cîhanê de hateya avakirin û yek ji nirxên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye. Ji ber vê yekê desteya jin xwedî girîngiyeke mezin di tevahiya herêmê de ye. Herwiha kar û xebatên me zêdetir xwe di avakirina civakek demokratîk, exlaqî û wekhevî di navbera jin û mêr de tên meşandin. Armanca me avakirina civaka ekolojî û azad e. Gelek rewşên jinan hene ku li hemberî tundiyê tên û ji bo parastina mafê wan em weke desteya jin ji wan re cihên bi ewle peyîda dikin. Di heman demê de, zêdetir karê ku em pê radibin aktîvkirina jinê di warê siyasî de ye, em hewldidin ku hêza xwe di aliyê paratina jinê cewherî de jî xurtbikin. Lewma parastina mafê zarokan erkekî li ser milê me ye û em bi vî erkî radibin. Da ku baldarbûn li ser zarokan çêbibe, ji ber ku di encama şerê ku di herêmê de rûda gelek zarok sêwî man. Mala zarokan, perwerdekirin, çalakî, xwedîkirin û pirojeyên wan girêdayî desteyê ne. Helbet dema ku zarokên sêwî rastî êş û zilmê tên em weke desteya jinê vî karî dişopîn li ser vê yekê tê rawestandin.”

### ‘jin bingeh û hebûna civakê ye’

Rohat Xelîl axaftina wiha berdewam kir: ”Desteya jinê gelek zagon ji bo zarok, jin û malbatê re danîne û ji aliyê meclisên gelan ve hatin nîqaşkin û erêkirin. Heta niha ev zagon tên xwendin heta ku bighêje mena herî biçûk û mena herî biçûk jî komîn ne. Em perwerdeyên weke cîvîn û semîneran ji bo jin û mêr re çêdikin, da ku malbateke demokratîk û wekhev were avakirin. Ji bo hişyarkirina jinê û danesîna mafê wê em kampaniyan çêdikin. Lê kar û xebatên me bêhtirî xwe di avakirina civakek demokrat, exlaqî û wekhevî di navbera jin û mêr de ne. Herwiha ji bo geşkirina têkoşîn û berxwedana jinê ya li hember hemû cûreyên tundiyê yên ku li ser tên meşandin, kar dikin. Di heman demê de, em hewil didin rola jinê di hundirê civak û saziyan de aktîvtir bikin, da ku jin di hundirê civakê de bibe pêşeng û xwediya hebûn û biriyarê, ji ber ku jin bingeh û hebûna vê civakê ye.”

### Xebatên 2025’an

Rohat Xelî da zanîn ku xebatên sala 2025’an piranî mijarên tundiya ku li ser jinê dihat meşandin bûn û wiha pêde çû: “Hejmara jinên ku tundiya li ser wan dihat meşandin di îsal de zêde bûn, lê ev yek hate çareserkirin. Jinên ku metersî li ser wan hebûn, pirojeyê me di aliyê fêrbûna ziman de ji bo wan re hebûn. Navendên Amara yên girêdayî desteya jin gelek semîner di aliyê derûnî dan û ji gelek endamên saziyên Rêveberiya Xweser perwerde hatin çêkirin. Gelek jin di aliyê derûnî rewşa wan nebaş bûn, lê bi riya wan celsatên ku hatin çêkirin, rewşa wan baştir bûn. Me ji bo zarokan pilansazî ji wan re danîn û ekadimî ji bo wan zarokan re vekirin, da ku em wan zarokan perwerdebikin. Pirojeyên me weke ekadimiya Nalîn Mûş tevahiya karmedên Rêveberiya Xweser tê de perwerdeyên xwe dibînin. Lewma encamên pir baş ji wê ekadimiyê derketin.”

“Mala zarokan di asteke baş de karê wê hate şopandin û gelek semîrên girêdayî zagonên malbatê hatin lidarxistin. Îsal aliyên raporên ofîsên jin di hundirê desteyan de hatin nivîsandin û hatin erêkirin, di heman demê de ji bo tevahiya desteyan û ofîsan re hatin xwendin. Da ku hemahengiya jinê di hundirê desteyê zêdetir xurt bibe û ofîs bibe weke destekê bi seroka jin re. Lewma destpêkê weke reş nivîsbû, lê piştire di mecilsên gelan de hatin erêkirin. Çalakiyên girêdayî 8’ê Adar ku hatin lidarxistin em pê rabûn, em tevlî konfransê kongra Star yê sîstema serokatî bûn. Em beşdarî semînerekê bi rêxistina Nîda Jinêf re bûn û me mijarên zarokan yên di nava şer de nîqaş kirin. Zagonên zarokan hatin xwendin û şîrovkirin.”

### Pirojeyên dema pêş

Rêveberiya Desteya Jin a kantona Cizîrê Rohat Xelîl axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Pirojeyên di nava destê me de kargeheke tiştên bi lastîk in û heta vê demê em li ser kar dikin. Ji bo demên pêş em amedekariya çêkirina kargehekê ji bo pêwîstiyên jin û zarokan dikin. Em amedekariyên xwe ji bo 19’ê Tîrmehê û 25’ê mijdarê dikin. Lewma ji bo roja cîhanî ya zarokan em hazirtiyên xwe dikin ku şahiyan ji bo zarokna lidarbixin. Em jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî sîstem in, ji ber vê yekê pêwîst e em bibin bingeh ji bo tevahiya jinê Sûriyê. Em dibîn ku hikumeta Şamê ya veguhêz mafê habû pêkahatiyên li Sûriyê paşguh dike û bi taybet mafê jinê paşguh dike. Ji ber vê yekê em vê hikumeta bi vî rengî, bi tu awayî napejrînin. Pêwîst e jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê asta rêxistbûna xwe xurtbikin, da ku karibin rola xwe di Sûriya nû de bilîzin.”

# ‘HTŞ’ê bi zihniyeta DAIŞ’ê tevdigere’

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Rojnamevan Sîlva Îbrahîm diyar kir ku hilweşandina rêjîma Baas ji bo gelên Sûriyê bû hêvî, bendawariyeke guhertin û veguhertinê hebû, lê bi hatina HTŞ’ê re alozî kurtir bûn, komkujî û revandina jinan zêdetir bûn.**

Di 8’ê Kanûnê 2024’an de bi hilweşandina Desthilatdariya Rejîma Baas re HTŞ’ê hate ser desthilatdariya Sûriyê, ji bo pêşeroja gelê Sûriyê û aramiya gelê sûriyê tu guhertin nehatin çêkirin. Sîstema neqebûlkirina mafê jin ku çawa Rejîma Baas îradeya jin nedîtî ve dihat heman zihniyet ji aliyê HTŞ’ê ve jî tê meşandin. Kiryarên ku li Beravê û Siwêdayê li ser gelê Dûrzî û Elewî tên meşandin rastiya HTŞ’ê radixe berçavan, rojane




kuştin, revandin û destdirêjiyên li ser jin zêde dibin. Kiryarên HTŞ’ê zhniyeta DAÎŞ’ê diyar dike.

Girêdayî vê mijarê Rojnamevan Sîlva Îbrahîm ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Jinên Elewî û Durzî bi zihniyeta DAÎŞ’ê tên kuştin û revandin’

Sîlva Îbrahîm destnîşan kir ku ev 7 mehin Sûriyê di nava alozî û qeyranan de derbas dibe û wiha got: “Bi hilweşandina Rêjîma Baas re û bi hatina desthilatdariya HTŞ’ê re komkûji zêdetir bûn, HTŞ’ê di bin navê ku gelê Elewî bermahiyên Rêjîma Baas in gelek kes kuştin û gelek jin hatin revandin, qetilkirin û firotin, HTŞ’ê bi zihniyeta DAÎŞ’ê tevdiger e. HTŞ’e ev 15 rojin ku qetlîam û revandinê li ser gelê Siwêdayê pêk tînin. Gelek jin û zarok jiyana xwe ji destdan û 79 jin jî hatin revandin heta niha jî çaranûsawan ne diyare. Ji 8 Kanûna 2024’an heta niha komkujiyên li ser gelê Sûriyê nehatine rawestandin.”

### ‘HTŞ’ê zihniyeta tundperestî dimeşîn e’

Sîlva Îbrahîm da zanîn ku HTŞ’ê bi zihniyeteke qirker li beramberî jinan tevdiger e û wiha domand: “Jinên Elewî û Durzî bûn qurbana zihniyeta HTŞ’ê ya desthilatdar, qirker û tundperest. Herwiha piştî koçberiya hin gelên Elewî ji Berava Sûriyê û hatin wan a li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê re me hevdîtin bi jinên Elewî re çêkir jinên Elewî digotin ku me bi çavên xwe didît dema ku HTŞ’ê derbasî Berava Sûriyê bûye, digotin hemû jinên xweşik bînin ji bo ku em wan jinan ji xwe re bibin û ji Serçeteyên xwe re diyarî bikin, mixabin ev zihniyeta qirêj ya HTŞ’ê ku tu cudabûna wê ji ya DAÎŞ’ê nîne li ser jinan tê meşandin zihniyetek wisa wê çawa berpirsyarê Sûriyê bike? Herwiha kêsên ku destê wan di qetilkirin, revandin û tecewîza li ser jinê de hene HTŞ’ê ew xistin asta fermandariyê weke Hatim-Ebo Şeqra û Ebo Emşê ve. Ev kêsên wiha lazime werin cezakirin.”

### ‘Jina Kurd bûye sembola hêz û parastinê’

Rojnamevan Sîlva Îbrahîm axaftina xwe wiha qedand: “Îro jina Kurd bûye sembola hêz û parastinê, jinên Durzî yê li Siwêdayê ji bo parastina warê xwe û di heman demê de ji bo parastina xwe ji HTŞ’ê, çek hildan ji bo ku li hemberê zîhniyeta HTŞ’ê a navendî, radîkal û qirkerbiparêz e. Herwiha jina Durzî a bi nave Fevziye El Şeranî bi temenê xwe yê mezin ji bo parastina welatê xwe çek hilda û şeş ji çeteyên HTŞ’ê kuştin lê mixabin ew çeteyên HTŞ’ê yên bê wijdan ew dayîk kuştin. Jin hertim sembola hêz û cesaretê ye tu carî ew zihniyeta mêrên qirker jinê naşkîn e.”



# Sînemagerî û derhênerî ji bo Yilmaz Elî xewnek bû

**Derhêner Yilmaz Elî diyar kir ku ji zaroktiyê ve sînemagerî û lîstikvaniyê şopên xwe di jiyana wî de çêkirine û wî heta roja îro ev rê bi hezkirin berdewam kiriye.**

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Yilmaz Elî di 1’ê Çileya sala 1993’an de li Kobanê jidayîk bûye û li wir xwendina seretayî qedandiye, piştê wê berê xwe da bajarê Helebê û xwendina xwe heta qonaxa amadehî li wir qedandiye. Piştre ji bo xwendina derhêneriyê û sînema berê xwe da Ukraniya, piştî qedandina xwendina xwe careke din berê xwe da Rojavayê Kurdistanê û dest bi karê derhêneriyê kir. Niha jî li peymangeha Bilind a Hunerê mamosteyê montacê ye di beşê sînema de.

Di derbarê jiyan û kar û xebatên xwe yên derhêneriyê de Derhêner Yilmaz Elî ji Rojnameya me re axivî.




### Kurtejiyana wî

YIlmaz Elî da zanîn ku dayîk û bavê wî hêz danê da ku ew riyê sînemageriyê û derhêneriyê berdewam bike û wiha got: “Bavê min him parêzer bû him jî mozîkjen bû, lewma ez ji biçûkaniya xwe ve ji wî fêrî mozîkê bûm û di heman demê de min wêne jî xêz dikirin û di dibistanê de wêneyên min yên balkêş dihatin dîtin. Ji zarokatiyê ve hezkirina min ji fîlim û sînema re çêbû lê ez hîn tênegihiştibûn ku ez ê vê xwendinê bikim û bibim sînemager ji ber ku ev tişt li cem me mîna xwenekî bû. Lê tevî wilo jî min li filim û rêzefilman gelekî temaşe dikir û hertim pirs di bala min de hebûn gelo bi çi şêwazî ev filim tên amadekirin. Piştî qedandina seretayî malbata min biryar da ku mala xwe ji Kobanê bar bikin û berê xwe bidin bajarê Helebê, ez gelekî êşiyam ji ber ku ez dûrî cih û warê xwe ketim û min berê xwe da civakek din. li Helebê min li dibistana navîn a Ibin Elruşid xwendin û piştî ku ez ji dibistanê derdikatim min berê xwe dida Kolana Qiwetlî, li wir opêra hebû êdî ew teşwîq bûn û xwesteka ku ez lîstikvaniyê bixwînim li cem min zêde bû. Dema min xwendina navîn qedandin havînî min berê xwe da Libnanê û li wir hinekî geriyan û di heman demê de dixebitîm jî, piştî ku ez ji Libnanê vegeriyam min biryara ku ez bibim derhêner û sînemager da.”

Elî axaftina xwe domand û wiha got: “Piştî ku ez ji Libnanê vegeriyam min dest bi lêpirsînê kir da ku ez vê xewna xwe bikim rastî, dema malbata min jî ji bo min dipirsiyan derket li Sûriyê derhênerê sînema nîne tenê peymangiha Bilind a hunerên şanoyî beşê lîstikvaniyê heye. Ji bo vê yekê min gelek lêpirsîn û niqaş dikirin gelo wê malbata min bikaribe min rêke ji derveyî welat da ku ez vê xewnê pêk bînim, tevî ku rewşa me ya madî baş bû bavê min li Helebê dest bi kar kiribû û dayîka min jî bexçeyê zarokan vekiribû. Êdî min xwendina xwe ya amadehî berdewam kir û ev xewn jî bi min re mezin dibû roj bi roj, ez di wê baweriyê debûm ku wê rojek bê ez ê vê xewnê pêk bînin, lê çawa û çilo nizanim. Rojekî bavê min kazî min kir da ku herim ofîsa wî ya parêzeriyê dema gihiştim du lêstikvanên Sûriyê li gel wîne Nasir Werdiyanî û Riyad Werdiyanî herdu birayên hev in helebî bûn, ji min re gotin cihê baş ji bo xendina sînema, li Misir peymangiha bilind a sînema heye û li Rosiya jî heye. Lê li gor nêrêna wan ku ez herim Rosiya bixwînim wê baştir bê ji ber ku xwendina wan xurttire.”

Elî axaftina xwe berdewam kir û wiha got: “Di dema ku min li dibistanê dixwendin min gelek pirtûkên şano, sînema, huner û dîrokê dixwendin û li gelek filaman temaşe dikirin bi taybet filmê Bêrîtan ez bûbûm aşiqê wî filmî. Di heman demê de min li ser mûzîkjeniyê jî pirtûk dixwendin û li tembûrê dixist. Êdî piştî qedandina refa 12’an min xwe qeyd kir da ku berê xwe bidim bajarê Xarkof li Okraniya. Dest pêkê li Okraniya ez çûm bajarê Odêsa li ser deryaya Reş, li wir min zimanê Rûsî xwendin û bawernameya ziman bidest xist û min berê xwe da bajarê Xarkof û li zanîngeha Kultûra min xwe qeyd kir û dest bi xwendina derhênerî û sînema kir ji sala 2012’an heya sala 2017‘an de min bidawî kir. Ji destpêka ku ez herim Okraniya min biryar dabû ku piştî qedandina xwendinê ez careke din vegerim Rojavayê Kurdistanê. Piştî Şoreşa Rojava li darket êdî min biryar da ku ez ê vegerim da ku bi riya xwendina xwe ez alîkariyê bidim gelê xwe. Ez ji Okraniya vegeriyam û demekî li Libnanê mam, li wir derhêner Ramî Hene rêzefilimek çêdikir binavê Tango, dema ez gihiştim wir rêzefilim ber bi dawî ve diçû ez bi wan re bûm alîkar di milê derhêneriyê de. Piştî wê min berê xwe da Rojavayê Kurdistanê di heman demê de malbata min piştî şerê Kobanê ber xwe dabûn Bakurê Kurdistanê û ji wir ber bi Ewropa ve çûnbûn.”

### Kar û xebat

Elî diyar kir ku dema ku ew sala duyem bû li zanîngehê wê demê nivîskarek Sûrî li Bîlerosiya dijiya, navê wî Memdûh Hemada bû wî nêzî 20 rêzefilm li Sûriyê nivîsandibûn û wiha got: “Di riya malperên medyayê re min ew naskiribû min jê xwest ku kurtefilmekî ji min re binvîsê, wî jî xwesteka min erê kir min bawer nedikir ku yek wekî wî ji min re binvîsê, piştî sê rojan kurtefilma ku min xwestî nivîsî bi zimanê erebî serenavê wî jî Elbab bû. Ew kurtefilma yekem bû ku min çêkir û heya niha jî di malberên Gogil de heye, me rêkir Sînema Elkindî li şamê di festîvalekî de pêşkêş kirin ev destpêkek bû ku ez bi wî hestî riya xwe berdewam bikim. Piştî wê êdî min gelek belgefilim çêkirin li ser kultûra Okranî, filiklor û cil û bergên Okranî ev belgefilim li zanîngehê kêfa gelekan jê re hat, piştî wê min kurtefilmek din bi navê Elyasemîn çêkir bi zimanê Rosî bû û lêstikvanên min jî hemû rosî bûn, ev kurtefilim li gelek festîvalan li Okraniya hat pêşkêş kirin û keyfa gelekan jêre hat. Her wiha bi derhêneriyê re min karê lîstikvanî û wênekêşiyê jî kiriye.

Min kurtefilmek nivîsand bi zimanê erebî bi navê Île Elmechûl û min radestî girûpekî kir li Himsê karê filman dikirin. Her wiha ez bi wezareta Lîbiya ya çandê re bûm alîkar di milê montackirina filman de û bi awayekî fermî hikumeta Lîbiya spasnameyek dan min. Êdî ez derbasî Rojavayê Kursidtanê bûn û li Kobanê komîna Film hebû ez hinekî bi wan re bûn alîkar û piştî wê min berê xwe da Mexmûrê û li wir jî ez demekî mam û min belgefilmeke dirêj bi navê Tekoşîn çêkir li ser jiyana mexmûrê. Di heman demê dem ez bûm alîkar bi çêkirina bi dehan fîdiyo kilîp, bi gelek hunermendên di Rojava de û bi saziyên rêxistinê re bûme alîkar di milê derhênerî û montaca vîdiyo kilîpan de. Her wiha bi gelek saziyan re bûm alîkar di milê pêşketina montacê de.”

Elî da zanîn ku li Mexmûr wan kurtefilmek bi navê Pêlava Sor çêkir ew têde lîstikvan bû û wiha got: “Kişandina dîmen û montaca wê jî min kir, hevalê min bû derhêner, ev kurtefilm me şand festîvala New York a Navnetewî û li wir hat pêşkêş kirin û piştî wê li festîvala Viyêna li Nêmsa ya Navnetewî jî hat pêşkêş kirin û xelat baştirîn kurtefilim hat bidest xistin. Êdî careke din ez vegeriyam Rojava û li wir belgefilmeke dirêj bi zimanê erebî bi navê Hêstirên ku cîhan nabîne li ser Serê kaniyê çêkir û gelekî hate temaşe kirin. Di heman demê de min derhênerî û montaca bernameyan jî dikir wek bernameya Pêlên Hunerî 22 xelek bûn li ser qenala Rojava Tv dihat pêşkêş kirin. Piştî ku ez derbasî Komîna Filim a Rojava bûm min cihê xwe di nav rêveberiya wê de girt sê berhem li pêşiya me bûn, me filmek dirêj bi navê Heval Birako çêkir ez di rêveberiya pirojê de bûm û heman demê de min lîstikvanî û pirodikisyona wê jî kir û me bidawî kir û wê di Demeke nêz de were pêşkêş kirin. Niha jî em filmekî din amade dikin bi navê Heval Keça min, di wir de jî ez di rêveberiya film de me û di pirodikisyona wê jî dikim. Her wiha ez niha mamosteyê montacê me di beşê sînema de li Peymangeha Bilind a Hunerê li bajarê Dêrikê.”



### Guhertinên ku Şoreşa Rojava çêkirin

Elî axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: “Dema şoreşek li dar dikeve her tiştî bi xwe re diguherîne, Şoreşa Rojava jî dema li darket gelek guhertinên ber biçav bi xwe re anîn yek ji wan di milê sînema de bû, kurdan hertim bi çavekî biçûk li xwe dimeyzandin ku em nika tiştekî wiha bikin yên din biyanîne ji me bêtir dizanin karê sînema û lîstikvaniyê bikin lê ne wisa bû. Di van salên dawiyê de kar û xebatên gelekî pîroz yên sînema çêbûn, di dema berê de tenê em temaşevan bûn lê piştî şoreşê em bûn çêkerê vî karî. Şoreşa Rojava girîngî da hemû tiştan bi taybet sînema, piştî ku çend filim hatin amadekirin û pêşkêş kirin û gel ket wê ferq û baweriyê de ku kurd dikarin cihê xwe di vî alî de jî bigrin. Mînaka berbiçan Peymangeha bilind a Hunerê bû dema vebû çawa xwendekar biheyecan û hezkirin hatin ji bo vê xwendinê. Di dema berê de jî malbatn jî ev yek qebûl nedikir ku zarokên wan berê xwe bidin xwendineke wisa de. Piştî Şoreşê sînema gelek êşên me anîn ziman mînak filmê Kobanê ku heya niha bandora wê heye.”

Derhêner Yelmaz Elî axaftina xwe bidawî kir û wiha got:” Di dema pêş de em hazirtiyê dikin ji bo filmek dirêj. Di heman demê de ez belgefilmekî dirêj li ser sînema Amûdê çêdikin, ji ber ku avaniya sînema amûdê niha tê çêkirin wê bi dawîkirina belgefilmê bi vekirina avaniyê re were pêşkêş kirin. Her wiha ez di beşê sînema de karê diplomasiyê dikim li ser navê Bakur û Rojhilatê Sûriyê.”

# Xwendina Tezên Rêber Apo; pêşxistina asoyên ciwanên serdemê ye

Xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan li Rojavayê Kurdistanê bûye çandek û bi awayekî sîstematîk tên xwendin. Bi pêşengtiya ciwanên Kurd bi navê Tezên Rêber Apo perwerde tê dîtin û şopeke bi bandor di keseyeta wan de ava kiriye.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Pirtûk, parêzname, raman û analîzên Rêber Apo, ji bo avakirina kes, civak û pergalê xwediyê bingeha avakirina civakeke demokratîk, azad û bi zaniste. Rêber Apo ji bo tevahî cîhanê xwediyê felsefeya nû a jiyana azad tê dîtin. Ji lewra ger em bixwazibin di nava şer, geşedan û sîstema modernîteyê de serwext bibin û bibin xwediyê sekneke azad û zane, helbet divê em Rêber Apo bixwînin û têbighêjin. Ev gav di nava sazî, testgeh, tevger û hemû civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji çend salan ve bi awayekê sîstematîk li ser pirtûkên Rêber Apo perwerde tên dîtin, şîrove, nîqaş û nêrîn derdikevin pêş. Ciwan û jinên Ciwan jî yên ku kar dikin li kêlek xebatê xwe, cihê xwe di nava van perwerdeyan de digrin.

Têkildarî Perwerdeyên li ser Tezên Rêber Apo Endamên Ronahî TV yên ku heftê du caran perwerde dibin Ciwana Ebdî, Ehmed Ehmo û Lena Îbrahîm ji rojnameya me re axvîn.

**‘Da ku pêvajo bê fêmkirin, pêwstî bi xwendina Rêbertî heye’**

Ciwana Ebdî di destpêkê de ev anî ziman: “Di vê pêvajoya nû a ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî Kurdistan tê re derbas dibe, da ku em bikaribin siyaste û geşedanên li ser rûyê erdê tên pêkanîn fem bikin, pêwîstiya me bi xwendina Rêber Apo heye. Em nêzî salek û nîv perwerdeya li ser Pirtûka Sosyolojiya Azadiyê dibînin, ev yek jî



**Ciwana Ebdî**

di kesayeta me de hebûn û lêgerîneke cuda, xurtir û têgihştîtir dide avakirin. Her carê em perwerdê dibînin, lêgerîna me a pêşerojê xurtir dibe û ji nêz ve naskirina Rêbertî di me de pêş dikeve”. Her wiha Ciwana bal kişand ser girîngiya xwendina tezên Rêber Apo ji bo Jinên Ciwan û wiha pê de çû: “Di hundir pirtûka Sosyolojiya Azaiyê de çawaniya birêxistinkirina jinên Kurdistanê di nava şoreşa jin de hatiye şîrovekirin, her wiha çawaniya xwerizgarkirina ji zihniyeta desthilatdar a ku zêdetirî 5 hezar sal hatiye ferizkirin, tê şîrovekirin û naskirin. em dikarin bêjin ku di hundir vê pirtûkê de ji n dikare xwe nas bike, civakê nas bike û pê re xwe rizgar bike ye. Rêber Apo jî dibêje “Azadiya jinê azadiya civakê ye”. ger jin azad nebe wê demê civakeke azad jî ne mumkine. Li ser vê esasê em jî Jinên Ciwan me xwest em tevlî vê perwerdê bibin da ku em em hundir û derdora xwe nas bikin û pê re têkoşîna guhartinê bidin meşandin. Êdî jin divê bi xxwendina Rêber Apo xwe ji xefkên civakê biparêze û kefenê desthilatdariyê û tunekirinê biqetîne û azad bibe”.



**Ehmed Hemo**

**Sîstema perwerdeyê**

Ehmed Ehmo girêdayî sîstema perwerdeyê wiha axivî: “Ev saleke li ser parêznameya Rêber Apo ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê bi komekî hevalên televîzyonê re perwerde dibînim. Her wiha hevalên derve jî tên perwerdeya me dişopînin. Perwerda me bi du koman pêk tê. Her roja çarşem û yekşemê bi rêk û pêk perwerde dibînin. Di perwerdê de destpêkê beşek ji parêznameya Rêber Apo tê xwendin, duv re hemû hevalên hazir li ser nîqaş dikin”.

**‘Dîtina perwerdeyê li ser pirtûkên Rêber Apo, şanseke’**

Ehmed da zanîn ku bi xwendina Rêber Apo re ew rastiya pergalê dibînin û wiha pê de çû: “Perwerdeyek wiha berê min nedîtibû. Ji ber derfetek wiha li gel min ava nebûbû. Bi saya vê perwerdeyê fikr û felsefeya Rêber Apo nas kir. Bi taybetî pergala kapîtalîzmê ku ji dîrokê heya niha li ser civakan gelek tiştên çanda wê xera dike, bê



**Lena Îbrahîm**

nasname dihêle û pê re jî li ser wan berjewendiyê xwe dimeşîne. Ev yek jî pir balê dikişîne. Dema em roja xwe ya îro dinêrin bandora vê pergalê hîna jî li ser me heye. Li kêleka perwerde divê mirov şexsî jî li ser bifikire bê ka ew pergala kapîtalîzmê ku dijminahiya mirovan dike çawa li ser me bandorê xwe çêkiriye. Dema ku her yek ji me li ser vê yekê bifikirin her çi qas kêm jî be karin xwe biparêzin. Helbet perwerdeya ku em dibînin ji bo me şenseke ku her hatina me tiştên nû fêr dibin.

Di parêznameya Sosyolojiya Azadiyê de nêzîkatiya me li hember netewên din, zimanên din çawa bin û em çawa karin di nava aştiyê de bijîn, bêyî ku dijberî bikin, bi hişmendiya demokratîk jiyana hevpar çawa ava bikin Serokatî di parêznameyê de bi awayekî zelal ji me re gotiye”.

**‘Divê tişta ku em fêr dibin bi derdor re parve bikin’**

Ehmed wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Zehmetiya ku me di perwerdê de dibînin piranî li ser têgînên ku heya niha me nedîtine, bi şîrovekirina hevalan em hîn dibin. Ev yek jî dihêle ku em fêmkirina parêznameya Rêbertî û wan di jiyana xwe de pêkanînê de feyde jê bistînin. Em jî wek şopdarê Rêber Apo di vê perwerdeyê de tişta em fêr bibin hewl bidin derdorê xwe jî fêr bikin û bidin nasîn ku karibin jiyana demokratîk, wekhev, azad bi hevre bijîn”.

**‘Ger ciwan dixwazin li gorî rastiya civak û pêvajoyê devbigerin, divê Rêbertî bixwînin’**

Lena Îbrahîm da znîn ku bi vê perwerdeyê re wê zêdetir girîngiya rola jin di avakirina civakê de nas kir her wiha bang li ciwanan kir ku tevlî van perwerdeyan bibin û wiha got: “Bi rastî tevlîbûna me ji vê perwerdeyê re di kesayeta me de gelek tişt pêşxistin ji tevgera me di nava civakê de bigre heyanî avabûna sîstem û pergala heyî û çawa em di nava vê sîstemê de xwebirêxistin bikin. Bi taybet girîngiya rol û hebgûna jin di nava civakê de me bêhtir nas kir, ji wê zêdetir em hewil didin xwe nas bikin û li gor wê perwerdeyên kesayetî pêş bixînin.

Li ser van bingehan di vê pêvajoyê bi taybet de ez bang li hemû Ciwan û Jinên Ciwan dikim ku cihên xwe di nava van perwerdeyan de bigrin û xwe li ser tezên Rêbertî pêş bixînin. Ji ber ger ciwanek dixwaze li gor rastiya civakê û pêvajoyê xwe bighîne û mezin bike, divê li ser felsefe û rastiya Rêbertiyê perwerde bibe”.

# ‘Her rojek ji koçberiyê beramberî salekê ye’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Koçbera ji bajarê Efrînê Nêrgiz Hesen diyar kir ku êdî sebira wan nema, hêrs, kîn û nefreta wan li hemberî dagirkeriyê zêdetir dibe û got: “Bila axa me bi wan qirêj nebe, em xwedî xak û îradeyeke serbixwe ne, bese ji koçberiyê re, her rojek ji koçberiyê bi min salek e,”**

Dewleta Tirk di 20’ê Çileya 2018’an de li ser bajarê Efrînê dest bi êrişan kir. Her wiha bi van êrişan re li Efrînê sûcên pir mezin hatin kirin. Gelê Kurd bi kuştin, revandina jinan, girtina bi deh hezaran mirovan û koçberkirinê re rû bi rû man. Şêniyên Efrînê di sala 2018’an de ji ber êrişên hovane yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, neçarî koçberiyê bûn, niha jî gelek ji van koçberan li kampan bi cih bûne. Tevî berdewamkirina sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî şêniyên Efrînê, jinên koçber ên Efrînê bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kirin ku bi awayekî lezgîn destwerdanê bikin, dewleta Tirk a dagirker û çeteyan ji herêmê derxin û vegereke bi ewle ji bo koçberan mîsoger bikin. di vê çarçoveyê de Koçbera ji bajra Efrînê Nêrgiz Hesin ku niha di



kampa Newroz de niştecih bûye ji Rojnameya me re axivî.

**‘Me çi dît û çi nedît?’**

Koçbera ji bajra Efrînê Nêrgiz Hesin a ku bi temenê 48 saliye ku dayika 2 şehîda ye, belê ku niha li kampa Newroz bi cih bûye, Nergiz bi dilekî şewat behsa derketina xwe ji Efrînê kir, her wiha ji Efrînê bi êştir, derketina wan ya ji Şeheba yê bû, û wiha got: “Beriya sala 2018’an em li bajarê Efrînê bûn. mixabin di 20’ê Çileya 2018’an de dagirkeriya Tirk û çeteyên wê êrişên xwe yên hovane li ser bajarê Efrînê pêk anîn. Li vir min parçeyek ji cane xwe de ku kurekî min hat şehîd xistin, ne hesan bû ku mirov can û hem jî mal winda bike. Em ji neçarî koçberî kantona Şehbayê bûn. 7 salan em li Kantona Şehbayê di bin şert û mercên pir zehmet de bûn. lê dîsa jî me li hemberî van zehmetiyan tekoşîn dikir û me hêviyên xwe yên vegera Efrînê qut ne dikir. Êdî em fêrî rewşa jiyana li Şehbayê bûm, heya ku em kêmek fêrî rewşê bûm û niştecih bûn. dîsa êrişên hovana li ser hat kirin, ew êriş jî ji aliyê komên çete yên dagirkeriya Tirk û HTŞ`ê ve bûn. Me çi dît û çi nedît? Ew komên çeta ji xwe re derfetek dîtin ku êrişê gelê kurd bikin û komkujiyan di derheqên wan de pêk bînin. Ne mirov bûn, derketina me ya ji Şehbayê deh qat ji derketina Efrînê bi êştir û zehmetir bû.”

**‘Birînên me ji nû ve vekirin’**

Nêrgiz da zanîn ku ew tu carî rojên ji Şehbayê derketin ji bîr nakin û wiha got: “Li pêşiya çavên me ew komên çete dest tavêtin keç û xortên me, di heman demê de gelek kurd hatin revandin, qetilkirin û gotinên nebaş ji me re dihat kirin. Ti tişt ji destê me dernediket ku em bikin, yê ku parastina xwe dikir dihat kuştin. Em li ser zarokên xwe tirsiyan, ji ber vê yekê me çavê xwe kir çavê xwedê de da ku em bi silamet bighîjin Tebqa, lê çi tofanek bi ser me hat, gelek jinên ducanê zarokên xwe li ser rê anîn duniyayê, her wiha ew zarok jî ji serma û seqema zêde, di mirin. em jî mirovin mafê me yê jiyankirinê heye. Her cara ku em dibêjin va şer û koçberî qediya, careke din birînên me ji nû ve vekirin. Bimre dagirkerî, bimrin kesên bê wijdan.”

**‘Ev çend sal in em di bin şert û mercên dijwar de em dijîn’**

Nêrgiz balkişand ser jiyana wan a di kampa Newroz de û wiha got: “Çiqas em bêjin ku li kampan derfet hebe û tiştek ji me kêm tune be, dimîne kampa, dimîne koçberî û jiyana di bin konan de, em çiqas bêjin ku zehmete wê kêm be, em di kampan de ne rehetin, mirov hîsdike ku li kolana jiyan dike, ji ber ku ew jiyana malbatê ya taybet namîne, tu çidike her kes bi te dihese. Heya kengî emê di vê halê de bin. Em miletek ji xaka Sûriyê ne, em dixwazin vegerin bajar û malên xwe. Em dev ji Efrînê bernadin. Ev çend sal in em di bin şert û mercên dijwar de em dijîn. Di kampan de zivistan sar e û havînê germ e. Gelek nexweşî bi zarokan re çêdibin û di nava kampê de belav dibin. Pir zehmetî tên kişandin. Her rojek li koçberiyê, bi min salek e. Lê kîjan roj be û di çi temenî de be em ê bi rûmeta xwe vegerin Efrînê. Em bang li tevahî kesên eleqdar ji bo vegera Efrînê dikin ku bi erkên xwe rabe û çîroka koçberî û dagirkeriyê bi dawî bikin.”

**‘Em dagirkerî li ser xaka xwe qebûl nakin’**

Nêrgiz Hesin di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Piştî ku em koçber bûne, zarokên me ji dibistan, perwerde û xwendinê bê par mane, tenê ji gunhê van zarokan wê dagirkerî nemîne. Îdî sebira me nema, hêris, kîn û nefreta me roj bi roj li hemberî dagirkeriyê zêdetir dibe. Bila ji axa me derkevin, bila erdê me bi wan qirêj nebe. Em xwedî xak û îradeyek serbixwe ne, me li Efrînê ked û berxwedaniyek pir mezin da meşand û heya vê kêliyê jî berxwedan berdewam dike. Heta ku çete bi temamî dernekevin em vegera di bin kontrola wan de qebûl nakin. Em wan li ser xaka xwe qebûl nakin. Em ti tiştî naxazin, tenê em diwazin bi rûnet vegerin malê xwe. Ji ber vê yekê banga me ji hemû dewlet berpisiyar in û Neteweyên Yekbûyî (NY) gere zextek li ser dewleta Tirk bidin çêkirin wê çeteyên xwe ji xaka me vekişîne, wê demê jî em ê bi awayekî ewle vegerin Efrîna xwe.”



# Rêveberiya Xweser destê alîkariyê dirêjî hemû Sûriyan dike

Rêveberiya Xweser ji dema avabûna xwe û heya roja îro destekdayîna hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî Sûriyê dike, di heman demê de wê hîmê yekgirtina gelan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê da avakirin, herwiha ji perava Sûriyê jî alîkariyên mirovî pêşkêş kirin û her dem amadebûna xwe jî nîşan dide.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Rêveberiya Xweser di sala 2014’an de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate damezrandin, ev rêveberî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava xwe de digire û her dem ji bo mafdayîna pêkhateyên Sûriyê, bi taybet Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebatên xwe dide meşandin. Di nava şert û mercên zehmet de Rêveberiya Xweser, hêza QSD, YPG û YPJ’ê xwedî li hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê derketin, hem ew ji êrişên dagirkeriyê parastin, li kêlek wê ew ji destê çeteyên DAIŞ’ê rêzgar kirin. Di heman demê de rola pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi destê rêjîma Baasê hatibû tunekirin û her dem qirkirin li ser wan dihate kirin, aktîv kir û wateya ku ew jî beşek ji vê xakê ne bi wan da jiyankirin.

**Rêveberiya Xweser hîmê yekgirtina gelan e**

Rêveberiya Xweser xeta seyemîn a ku ne alîgirê tu aliyekî ye, hilbijart. Biryarên xwe jî li ser wekhevî û dadmendiyê dide meşandin. Herwiha armaca wê Sûriyeke demokratîk ku hemû Sûrî tê de bi ewle bin, bê avakirin. Ev rêveberî ji dema avabûna xwe heya roja îro rastî êrişên ku sîstema wê têk bibe tê, lê sîstema Rêveberiya Xweser hîmê xwe bi yekgirtina gelan daye avakirin, lewma hemû hewildan tên têkbirin.

**Erdnîgariyeke biçûk ji cîhanê re bû mînak**

Rêveberiya Xweser tevî ku di nava erdnîgariyeke biçûk de ye, lê rêxistinbûn û tecrûbeya wê ji cîhanê re bû mînak. Ev rêveberî destkeftiyên mezin dane qezenkirin û tecrûbeyên mezin jiyan kirin, hem jî di nava salên dûr û dirêj de bi hezaran berdêlên giranbuha hatin dayîn.

**Rêveberiya Xweser destekdayîna hemû pêkhateyên Sûriyê dike**



Rêveberiya Xweser tenê xwe bi erdnîgariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê sînordar nake, lê dema tê xwesetin ew destê alîkariyê ji bû hemû Sûriyê dirêj dike, ev yek jî ne tenê gotine û tê gotin, lê pêkanîna vê yekê di gelek deman de hate dîtin. Piştî ketina rêjîma Baas di 8’ê Kanona 2024’an de, Sûriyê aloziyên hîn mezintir ên ku ji sala 2011’an de hatibû destpêkirin, jiyan kir, ew alozî di nava tevahî Sûriyê de berbelav bû ku bi xwe re komkujiyên mezin anî. Derbasbûna hikumeta veguhêz ji Sûriyê re windahiyeke mezin ên mirovî, xwezayî û jiyanî hate kirin. Sûriyê di nava talên hîn mezintir derbas bû, destpêkê li deverên peravê pêvçûn, kiryar û komkujî hate destpêkirin, piştre li Siwêdayê jî heman rêbazê ku ji aliyê endamên ewlekariya giştî yên hikumeta veguhêz dihat kirin, pêk hat.

**Alîkariyên ku ji herêma Rêveberiya Xweser hatin şandin**

Ji ber wê di dema pêkanîna komujiyên li peravê tu alîkariyên mirovî ji bû gelên li wir nehatin kirin, lê tenê ji herêma Rêveberiya Xweser alîkarî hatin şandin ku Komeleya Alîkarî û Geşedanê ya Mezopotamyayê bi hemahengiya Desteya Kar û Barên Civakî û Kar a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, 3 caran kampaniya alîkariyên mirovî ji bo perava Sûriyê re şand. Yekem kampaniya alîkariyan di meha Adarê de bi hevkariya însiyatîfa gelên herêmê, Heyva Sor a Kurd û Rêveberiya Xweser ji perava Sûriyê re hatin şandin. Di karwana de 20 kamyon alîkariyê hebûn ku ji 10 hezar pakêtên xwarinê pêk dihat. Di 19’ê Gulanê de jî Komeleya Alîkarî û Geşedanê ya Mezopotamyayê bi hevkariya Desteya Kar û Barên Civakî û Kar a Rêveberiya Xweser karwanê 2 emîn kampaniya alîkariyên mirovî ji bo peravê Sûriyê re şandin. Herwiha Kampaniya alîkariyan ji hezar û 500 paketên xwarinê pêk dihat. Kampaniya alîkariyan a 3’emîn jî ji 6 hezar pakêtên xwarinê pêk dihat. Komeleya Mezopotamiya ya Alîkarî û Geşkirinê bi armanca alîkariyên mirovî û tendurstî di Adara 2025’an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin. Herwiha li gorî derfetên komeleya Mezopotamiya wê ev alîkariyên mirovî berdewam bikin û ev alîkarî li kesên hewcedar werin belavkirin.

Di heman demê de piştî komkujiyên ku li perava Sûriyê pêk hatin, ji bo pêşkeşkirina alîkariyên mirovî, di 17’ê Adarê de bi navê Insiyatîfa Gel a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi hemehengiya Heyva Sor a Kurd dest bi kampaniyeke hat kirin ku beriya şewata li peravê bê rûdan ji aliyê Heyva Sor a Kurd hezar pakêtên xwariyên hatin şandin. Di heman demê de hewildanên Heyva Sor a Kurd hate kirin ku dîsa 3 hezar pakêtan bi rêya 3 komyonan rêkin, lê ew gihiştin heyanî bajarê Reqa lê ji ber rewşê dîsa hat tolaqkirin, lê dîsa jî amadekariyên wan hene ku di zûtirîn dem de alîkariyên xwe derbas bikin. Li kêlek wê Heyva Sor a Kurd ji bo mexdûrên li Siwêdayê kampanya alîkariyê ragihand.

**Alîkariya vemrandina agirê li peravê**

Di 3’ê Tîrmehê de şewatên mezin li perava Sûriyê rû dan. Ji bo vemirandina şewatan aliyên xwecihî û herêmê ketine tevgerê û tîmên agirkujiyê yên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî tev li xebata vemirandina şewatê bûn. Ev yek berpirsiyariya neteweyî û mirovî ya Rêveberiya Xweser nîşan dide. karwanê piştgiriyê yê Rêveberiya Xweser ku çûn perava Sûriyê karwan ji 150 pisporên agirkujiyê yên ku perwerde li ser vemirandina şewatên berfiher dîtine, 18 erebeyên agirkujiyê yên ji kantonên Firat, Cizîr, Tebqa û Reqayê, 2 ambolans tevî tîmên wan, 2 tankerên mazotê û 2 tirêks, gelek erebeyên xizmetguzarî û alavên vemirandina agir û piştgiriya lojistîkî, pêk dihat.

Rêveberiya Xweser di heman demê de gelek malbatên ji perava Sûriyê koçber bûn, pêşwazî kirin û ew bi cih kirin, erkê xwe yê mirovî nîşan da û diyar kir ku Sûriyê ji bo hemû pêkhateyan e. Herwiha piştgiriya xwe ji bû Siwêdayê jî nîşan da û da zanîn ku ew ji bû hemû Sûriya amadeyî alîkariyê ye. Tevî ku ev rêveberî derfetên di destê wê de ne zêde ne, lê ew li gorî hemû derfetên xwe bi erkê xwe radibe.

# Li girtîgeha Merîwan gef li girtiyên siyasî tê xwarin

**Navenda Nûçeyan**

**Rêxistina Mafê Mirovan ya Kurdistanê ragihand ku berprisên girtîgehê gef li girtiyên siyasî yên li girtîgeha Merîwan dixwin û hate gotin; “Ev rewş siyaseta hikumetê ya ji bo bêdengkirina dengê nerazî yê li Rojhilatê Kurdistanê ye.”**

Rêxistina Mafê Mirovan ya Kurdistanê derbarê rewşa girtiyên siyasî yên li girtîgeha Merîwan ya Rojhilatê Kurdistanê de, daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de hate gotin ku berpirsên girtîgehê gef li girtiyên siyasî yên li girtîgeha Merîwan dixwin. Hate gotin ku girtî ji mafên xwe bê par tên hiştin, rûbiruyî bê rêzî û bazariyê tên.

Rêxistina Mafê Mirovan ya Kurdistanê da zanîn ku berpirsên girtîgehê ji bo şikandina îrade û teslîmbûnê van zextan li girtiyan dikin û hate gotin; “Ev rewş ne tenê binpêkirina rûmeta mirovane, di heman demê de siyaseta hikumetê ya ji bo bêdengkirina dengê nerazî ya li Rojhilatê Kurdistanê ye.”

Rêxistina Mafê Mirovan ya Kurdistanê navê berpirsên ku li girtîgeha Merîwan gef li girtiyan dixwin belav kir.

Li gorî navê wan berpirsan wiha ye: Berpirsê Parastina Girtîgehê Ferdîn Cîhanî, Rêveberê Navê Girtîgehê Mensur Xelwetî, Berpirsê Çandî yê Girtîgehê Reza Rustemî.

Hêjayî gotinê ye piştî agirbest di navbera Îran-Îsraîlê de hate ragihandin, heya niha zêdetirî 318 welatî û çalakvanên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê îstîxbarata Îranê ve hatin binçavkirin. Rojane li deverên cuda yên Îran û Rojhilatê Kurdistanê çalakvanên jin û ciwan ji aliyê hêzên ewlehiyê yên rejîma Îranê ve bi hincetên cûr be cûr têne girtin. Li gorî çalakvanan ragihandî, rejîma Îranê zextên xwe li ser civaka Behayî zêde kiriye ku rastî lêgerînên



bêserûber, girtin, desteserkirina milk û cezayên darvekirinan tên. Tevî ku rêjîma Îranê bêserûber li dijî girtiyên siyasî binpêkirinên mafê giurtiyan dike û tevahî zagonêîn mafê mirovan derbas dike, lê ji aliyê saziyên navneteweyî yên mafê mirovan tu helwestên xurt nayên nîşandan.

# ‘Armanca hikumeta veguhêz a Şamê parçekirina pêkhateyên Sûriyê ye’

**Edîtorê Beşa Erebî ya Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) Ehmed Mihemed destnîşan kir ku hikumeta veguhêz a Şamê bi aramnca yekrengbûna xwe li ser pêkhatiyên li herêmê feriz bike, komkujiyan li dijî gel û pêkhateyên Sûriyê pêk tîne.**

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Di derbarê rewşa dawî ya li Siwêdayê de edîtorê Beşa Erebî ya Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) Ehmed Mihmed bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Hêviya gelên Sûriyeyê ew bû ku piştî ketina Rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz a Şamê, aşîtî û aramî li Sûriyê pêk were, lê berovajî wê rewşa Sûriyê aloztir bû. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Piştî ketina Rêjîma Baas bi hevkariya hêzên navdewletî hikumeta veguhêz a Şamê hate ser deshildariyê, herwiha xewin û xeyalên tevahiya gelên Sûriyê ew bû ku piştî ketina rêjîma Baas Sûriyeke wekehev û demokratîk were avakirin û her kesî kêfxweşiya xwe ji bo vê yekê da xuyakirin. Lê mixabin piştî hatina hikumeta veguhêz a Şamê ew xewin û xeyalên gelên Sûriyê pêk nehatin. Em dibînin ku ev hikumet di 8’ê Adarê de li dijî civaka Elewî gelek komkujî pêk anîn û heta roja îro jî ev komkujî berdewam dikin. Di dema dawî de gelek komkujî li dijî pêkhateyên Durzî jî hatin pêkanîn. Ev hikumeta bi vî rengî bi tu awayî nikare nasnameya hemû pêkhateyên ku li herêmê dijîn hembêz bike, ji ber ku Sûriyê welatekî pirrengîn e û gelek pêkhate lê jiyan dikin. Ji ber vê yekê bi tu awayî gelên Sûriyê vê hikumeta bi vî rengî napejrînin.

Di heman demê de, heta niha Şoreşa Rojava negihiştiye armanca xwe û armaca gelên Sûriyê ew bû ku şoreşgerên di wê demê de derketin zihniyeta li Sûriyê hatiye ferzkirin, biguherînin. Herwiha kesên desthildar werin rakirin û li şûna wan kesên din werin danîn, ji ber bi hişmendiya Rêjîma Baas hikumeta Şamê ya veguhêz desthildariyê dide meşandin. Ji ber vê yekê heta roja îro armanca gelên Sûriyê di şoreşa xwe de pêk nehatiye, heta vê demê şer û pêvçûn li herêmên Sûriyê berdewam dikin.Herwiha pêkhateyên Sûriyê tên hedefgirtin û ratsî komkujiyan tên, hîn jî gef li pêkhateyên din yên li Sûriyê tên xwarin. Lewma di desthilatê de tenê yek rengî û yekalîbûn heye, hikumeta veguhêz a Şamê hizir, ol û yekbûna xwe li ser hemû pêkhateyan ferz dike. Ji ber vê yekê jî heta niha şoreşgerên Sûriyê yên ku ji destpêka şoreşê de cihê xwe girtin e, negiştine armanca xwe û demek dirêj li pêşiya wan e ku vê hişmendiya li Sûriyê biguherînin.

**-Piştî komkujiyên li peravê êdî li Siwêdayê jî li dijî Durziyan komkujî hatin pêkanîn, armanc ji van komkujiyan çi ye û berdewamiya vê yekê wê çi bi xwe re bîne?**

Ev demeke ku hikumeta veguhêz a Şamê li dijî gelê Durzî kiryar û komkujian pêk tîne û bi armana ku yekalîbûn û ola xwe li ser wan ferz bike, bi çi rê û rêbazan be dixwaze vê yekê pêk bîne. Dema ku dibîne ew nikara serweriya xwe li ser pêkhateyên li Sûriyê ferz bike komkujiyan pîk tîne. Tu cuhdahî di navabera hikumeta veguhêz a Şamû û rêbazê leşkerî yê rêjîma Baas tune ye. Piştî sala 2011’an çawa ku sîstema rêjîma Baas li hemberî şoreşageran û gelên Sûriyê yên ku azadî û aştî dixwestin, tang û topên xwe xistin meryetê û komkujî li dijî wan pêk anîn. Ev hikumeta veguhêz a Şamê jî rêbazên rêjîma Baas bi kar tîne û tu guhertin di wê hişmendiyê de tune ye.

Armaca sereke ya hikumta veguhêz a Şamê parçekirina pêkaheyan ne û tişta ku li sîstema Baas zêde dike ew e ku karibe pêkhatiyên li herêmê li dijî hev bide bikaranîn. Herwiha bi rengekî ku tevliheviyê di nava pêkateyên li Sûriyê de bide avakirin mîna vê yekê ya herî dawî dixwest bide diyarkirin ku şerê sine, dûrzî û elwiyan derdikeve weke ku hikumeta têkilya wê bi tiştekî bi vî rengî tun ye. Daxuyaniya herî dawî ya komîta şopandina komkujiyên li herêmên peravê ev yek da diyarkirin. Dixwaze pêkhateyan li dijî hev bide şerkirin, da ku desthilata xwe zêdetir ferz bike. Ji ber vê yekê em hertim tekez dikin ku hişmendî ew hişmediye, rêbazên ku dema rêjîma Baas bikartanîn niha jî tê bikaranîn. Hikumeta veguhêz a Şamê hin rêbazên zêdetir bi tundî ji ya rêjîma Baas dide meşandin.

**- Binketina hewldanan li Siwêdayê û qirkirina gelê Dûrzî vala derket, berxwedaniya gelê Durzî bi serket, vê berxwedaniyê çi di Sûrî de isbat kir?**

Tişta ku li Siwêdayê hate jiyankirin dide diyarkirin ku çiqasî civak bi rêxistinkirî be wê ew civak serkeftinan bidest bixe. Herwiha wê ew civak tu carî têkçûnê qebûl neke, tu rêxistineke civakî, siyasî û xweparstinê di wê herêma Peravê de tune bû. Di encamê de Elewî rastî komkujiyên pir mezin hatin, hikumeta veguhêz a Şamê dikarîbû bi riya hêza xwe ya leşkerî di wan herêman de xwe bi cih bike û serweriya xwe ferz bike. Lê li Siwêdayê civaka Dûrzî rêxistbûna xwe ava kirbû, heta rêxistbûna xwe di asta mecalis, hêza xwe ya leşkerî ji bo bervaniya xwe, hêzên xwe yên cewherî û hwd ava kirbûn. Lewma hikumeta veguhêz a Şamê bi êrîşa xwe ya leşkerî nikarîbû civaka Durzî li Siwêdayê têk bibe. Ji ber vê yekê dema ku gel birêxistinkirî be li kîjan herêma Sûriyê be wê hikumeta veguhêz a Şamê nikarîbe wê civakê tune bike. Nîşana ku tiştê civaka Durzî bi serxist berî wê xwe birêxistin kirbû, dizanîbûn ku armanc çi ye û berê wan bi kîjan aliyê ve ye. Ji ber vê yekê me dît ku di vê dema dawî de çiqas êrîş bi ser Dûrziyan de hatin, lê îradeya civaka Durzî bi ser ket.

Tekeze ku çiqas civak birêxistinkirî be wê ewqas serkeftinan qezenc bike. Ji ber vê yekê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji sala 2012’an û



heta niha tevî ewqas êriş û zehmetiyan jî destkeftiyên pir mezin tên qezenckirin û heta îroj têkoşîn berdewam e. Çavê wan lê bû ku piştî ketina rêjîma Baas, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev sîstem têk biçe, lê ev yek pêk nehat. Ev 8 mehin ku sîstema Baas têk çûye, lê hîn jî sîstema Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hêze û aliyekî sereke yê Sûriyê ye, herkes dixwaze pê re diyalogê bike da ku Sûriyê ber bi aramiyê ve bibin.

**-Li hemberî vê hişmendiya tundirew pêwîst e têkoşîneke çawa ji aliyê gelê Sûriyê ve were kirin?**

Li hemberî vê hişmendiya hikumeta veguhêz a Şamê, pêwîst e gelên Sûriyê şoreşa xwe berdewam bikin. Ji kesên ku piştî têkşûna Bass tevlî hikumeta veguhêz a Şamê bûne tê xwestin ku nêrîna xwe bugherin. Niha ji gelê Sûriyê tê xwestin ku vê şoreşa xwe berdewam bikin û li dijî vê hikumeta ku hatî ferzkirin xwe birêxistin bikin. Lewma helwestên xwe bidin diyarkirin û yekîtiya xwe ava bikin.

# Berpirsên Qirqirina Durzî û Elewiyan kî ne?

**Volqan Elî**

Belê, wekî dibêje; ti kes nemaye ku nizanibe li cîhanê gel, bawerî û olên Sûrî pirsgirêkekê dijîn. Ya rast ew e; hemwelatiyên Sûrî ev pirsgirêk, weke dûpişkekî di hemêza xwe de dîtine. Kî ye xwediyê vî dupişkê bê bext? Her hal ti kes dernakeve û nabêje, “hema min ev dûpişk berdaye pêsîra gel, ol û baweriyên herêmê”.

Wê demê em ê çawa bizanin ku kî ye berpirsiyarê vê felaketa xwînxwar? Yan jî ew ê ev felaketa li ser gelên herêmê kengî û çawa çareser bibe? na, ew qas ne zehmet e da ku em bizanin kî ye berpirsê vê felaketa xwînxwar:

Dibe ku em tehlîlek pir berfireh a serdemê nekin. Hewce ye lê ji ber ku mijarê zêde berfireh dike, wekî dibêje mirov nikare ji daristanê darên li ber çav jî bibîne. Bi yek hevokê; Îslama radîqal a cîhadîst (her çendî gotina Îslamê di nav de hebe jî ti eleqaya wê bi Îslamê re tine) ji aliyê dewletên giregir ên Cîhana Rojavayî ve li dijî Sosyalîzma Pêkhatî wekî tedbîrekê xistin dewreyê (DYE, Îngîltere û hwd). Dema ku di salên 1990’an de Sowyet Rûsya têkçû, ev hêzên neo-faşîst ên cîhadîst wekî hêzeke provokasyona li dijî gel û baweriyên herêma Rojhilata Navîn, ji nû ve hatin dîzaynkirin. Ji Talîbana Efxanîstanê, Îxwanî Mislimîn, bigire heta bi HTŞ’ya îro wisa bûn bela serê Îslama rast, bûn bela serê gelê Kurd, Dûrzî, Elewî, Ereb, Efxan ...

Hevoka duyemîn jî; ew bîrdoziya ku jê re cîhadîzm, Îslama siyasî yan jî Îslama radîkal tê gotin bi temamî provokasyonek li dijî baweriya Îslamê bi xwe ye. Lewra ji dema Selehadînê Eyubî, bi şûn ve hêzên emperyalîst ên Rojavayî, li gor (hêzên emperyalîst), dikeve şiklê berxikê (gel û baweriyên herêmê).

Ji ber wê yekê ye ku El-Qeîdeya di 2001’ê de li bajarên DYE’ê bi balafiran çalakî li dar xistibû, di rastiyê de ne bi Îslamê re lê bi hêzên hegemon re eleqadar bû. Ev jî ne sir û razek e, ew bi xwe li xwe mukur hatin ku çawa di hembêza xwediyên xwe de mezin bûne!

Dibe ku duh wisa bû lê îro jî ti kes venaşêre aşkere xuya ye: Mînaka herî dawî ya cîhadîst HTŞ bi hêzên hegemon ên cîhanê re li hev rûdinîn, ji wan piştgiriyê digire. Bila, eger li welatê jê re Sûrî tê gotin Elewiyên Peravê nehatibana jenosîdkirin, Durziyên ku diyariyên dîroka mirovahiyê ne di qirqirinê re nehatibana derbaskirin, Kurd bi xetereya heman çarenûsê re ne rû bi rû bûna, li Şamê û li vî yan jî wî bajarê Sûrî Erebên Sunnî jî di navê de bi jehra cîhadîst re nehatana jehrî kirin, bila hemû hêzên emperyalîst xalîçeyên sor raxistana li ber lingê Colanî. Li Parîs û nizanim kîjan payitextê pêşwazî bikirana! Mixabin ne wisa ye!

Colanî û HTŞ ji beriya ku bi ser Şamê de bimeşe her kes dizane ku li Idlibê wekî emîrekî Erdogan rûniştibû. Dema bazara Erdogan û hêzên emperyalîst li ser Colanî li hev hat, ew kirin emîrê Şamê. Parçeyek şekirê Şamê xistin devê Ehmedê Şeri yê nû û berê cîhadîstên wî jî dan Elewiyên peravê. Ev zêdetirê xwe hesabê Erdogan bû. Lê ne tenê yê wî bû. Cîhadîstên dev bi xwîn bi hezaran jinên Elewî revandin, kal û zarokên wan kuştin. Çima? Erdogan digot, “bila yek ol hebe” û ew cîhadîst jî ji bo pêkanîna vê amade bûn jixwe... Kerbela li Perava Sûrî di vê serdemê de dûbare bû! Bi xêra (!) kê? Gundê xuya dike ne hewceyî rêzana ye! Hesabên li ser welat û gelên Sûrî ne ewqas e. Dagirkeriya Tirk bi nexweşiya Osmaniyên nû, dixwaze li ser vî welatî bi her rengî bilîze. Nehêle ku Îsraîl serweriya xwe li vî welatî çêbike! Hêzên emperyalîst ên hegemon, timî dixwazin destê gelan di qiriqa hev de be da ku ew bi rehetî hespê xwe bimeşînin.

Hê çend hefteyan ji beriya vê li beravê Sûrî Kerbala bi sedan car hate dubarekirin. Îro dibe ku gelê bawermend ê Durzî li ber xwe da, xwe bi rêxistin kirin û li dijî terorîzma cîhadîst a DAIŞ, HTŞ û Firqet el-Hemze û nizam çi û çi, bi ser ketibe. Lê heya ku ev dupişkê jehrî di destê hêzên hegemon de be, ew xeter heye ku jenosîda Elewiyên peravê yan jî qirqirina li ser Durziyan, li cihekî din, li dijî baweriyeke cuda dubare bibe! Bawermendên Misilmanên Sunnî bi xwe yan jî Îsawiyên li vî welatî her li ber xeteyê ne. Lewra ji bo hişmendiya cîhadîst, ya girîng xwîn biherike, lê ne girîng e ku xwîna kê ye; Împaratoriya tarîtiyê wisa ava dibe!



# ‘Bidawîkirina destwerdana Tirkiyê, bidawîkirina kirîza Sûriyê ye’

**Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed destnîşan kir ku dewleta Tirk Sûriyeke demokratîk naxwaze, destwerdana dewleta Tirk li Sûriyê hişt ku kirîz dirêjtir bibe û got, “Eger destwerdana dewleta Tirk bi dawî bibe wê pirsgirêka Sûriyê jî çareser bibe.”**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Destwerdana dewleta Tirk di kirîza Sûriyê de ji destpêka sala 2011’an ve heta roja îro bênavber û bi awayên cuda tê domandin. Destwerdan li ser asta leşkerî, guhertina demografî, tevlîheviya ku di navbera hemû aliyên siyasî yên sûriyê de çêbû û hîna jî didome, rûda.

Yên ku bedelên giran di encama destwerdanên dewleta Tirk a dagirker de dan jî gelên Sûriyê bûn. Derbarê heman mijarê serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed ji rojnameya me re axivî.

**‘Dewleta Tirk Sûriyeke nû û demokratîk naxwaze’**

Telal Mihemed destnîşan kir ku dewleta Tirk Sûriyeke demokratîk naxwaze û wiha got: “Di destpêka Şoreşa Sûriyê de gel ji bo azadiyê û bi destxistina mafên xwe li dijî rêjîma Baas rabûn. Lê dema ku dewleta Tirk destwerdan di Sûriyê de kir û ev komên çete xist hembêza xwe, dewleta Tirk şoreş veguherand kirîz. Ev yek jî di warê bikaranîna çeteyên xwedî hişmendiya radîkal û çeteyên DAIŞ’ê de ji bo pêkanîna siyaset û berjewendiyên dewleta Tirk li Sûriyê. Bi vî rengî şoreş veguherî kirîz û rewşa gelên Sûriyê xerabtir bû, heta roja îro jî ev kirîz berdewam e, ji ber wê piştgirtiya HTŞ’ê kir û hêzeke xwedî hişmendiya radîkal anî ser desthilata Şamê. Bi riya destwerdana ku dewleta Tirk di Sûriyê de dikir û hîna didomîne, armancên wê hatin xuyakirin. Armanca wê ya sereke ew e ku gelê Kurd negihêje mafê xwe, ji ber wê jî naxwaze Sûriyeke nû û demokratîk were avakirin, lewma şerê projeya demokratîk a Rêveberiya Xweser a ku Kurd serkêşên wê ne, dike. Di heman demê de dixwaze bi riya vê kirîza Sûriyê projeya xwe ya Misaak Elmillî ku sînorê wê ji Helebê digihêje Kerkûk û Mûsl, pêk bîne.”

**‘Dewleta Tirk wê nikaribe li ser heman siyasetê destwerdanê bike’**

Mihemed da zanîn ku Tirkiyê wê nikaribe li ser heman siyasetê destwerdanan bike û wiha domand: “Dewleta Tirk bi dirêjahiya destwerdana di Sûriyê û kirîza wê de, gelek armancên ku ji bo wê kar dikir, bi dest xistin. Di serî de deweleta Tirk kirîza Sûriyê dirêj kir, nehişt diyalog di navbera gelên Sûriyê de çêbibe. Ji hêleke din ve dewleta Tirk nehişt ku gelê Kurd danûstandinan bi rêjîma Baas re çêbike, di roja îro de jî bi sedema destwerdana wê astengî di navbera gelê Kurd û desthilata Şamê ya veguhêz de çêdibin. Li aliyê din jî dewlta Tirk li Rojavayê Kurdistanê gelek astengî xistin navbera nêzîkbûn û yekbûna Kurdan. Armanc jê ew bû ku pirsgirêka Kurdî çareser nebe û kirîza Sûriyê bi dawî nebe. Lê di siberojê de dewleta Tirk wê nema bikare destwerdanên xwe û siyaseta kevin li Sûriyê bimeşîne. Ji ber ku bi sedema van destwerdanên Erdogan û AKP’ê rewşa hundirê Tirkiyê ber bi aloziyeke mezin ve çûye. Wê hebûna dewleta Tirk li Sûriyê bi lihevkirineke navnetewî ve girêdayî be, li ser esasê diyaloga di navbera hikumeta Şamê û Rêveberiya Xweser de hemû pirsgirêk çareser bibin. Eger çareserî çênebe wê sînaryoyên cuda çêbibin.”

**‘Eger destwerdana dewleta Tirk raweste, wê kirîza Sûriyê çareser bibe’**

Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed tekez kirin ku eger destwerdana dewleta Tirk bi dawî bibe wê kirîza Sûriyê jî çareser bibe û wiha axivî: “Di Rojhilata Navîn de projeyên nû ji



bo hilweşandina rêjîmên desthilatdar û şofînî hene, di heman demê de nakokî di navbera hin hêzên navnetewî yên li herêmê çêdibin. Di roja heyî de hewldanên ji bo lihevkirina di navbera hikumeta veguhêz a Şamê û Rêvberiya Xweser de tê kirin, hêzên navnetewî jî bi rola navbênkar dilîzin. Vaye dewleta Firansayê ji rola piştgiriyê ber bi navbênkarî û serpereştiyê ve kar dike. Niha gelek hewldan tên kirin ku diyalog ji bo çareserkirina pirsgirêka gelên Sûriyê tê kirin, diyalog jî di çarçoveya lihevkirina gelên Sûriyê li ser sîstemeke nenavendî ku mafê hemû gelan tê de parastî be. Eger ev pirsgirêk çareser bibin em bawer nakin ku dewleta Tirk wê bikaribe destwerdana xwe di Sûriyê de bidomîne. Dibe ku bi reza xwe derkeve ji xaka Sûriyê û nema destwerdanê bike, yan jî bi biryareke navnetewî derkeve. Eger dewleta Tirk nema destwerdanê bike, wê demê pirsgirêka Sûriyê wê bi dawî bibe.”

## Li Sûriyê kî çi dixwaze?



**Zekî Bedran**

Li Sûriyê komkujî û danûstandin berdewam dikin. Tevî hemû paqijkirin û hewldanên ku wan bikin armanc jî, hişmendiya HTŞ’ê nîyeta xwe ya rasteqîn eşkere dike. HTŞ’ê di avakirina hikûmetek berfireh de bi ser neketiye. Li şûna ku pirsgirêkan bi goftûgo û rêbazên demokratîk çareser bike, ew komên ku serê mirovan jê dikin ji gel re dişîn e. Li cihê ku ev kom dikevin hundir, dûman radibe û bi sedan cenaze li dû xwe dihêle. Gel rastî wêraniyeke mezin hatiye û mîna ku ev ne têrker e, ew bi komkujî, wêranî, mirin û koçberiya HTŞ’ê re jî rû bi rû ne. Civîna Şamê, ku ji aliyê T. Barrack ve dihat birêvebirin, bê encam bi dawî bû. Di daxuyaniyên xwe yên li civînê de, wî QSD û Rêveberiya Xweser sûcdar kir. Li şûna ku aliyan nêzîkî hev bike, bingehek baweriyê biafirîne, an jî di hin mijaran de gavan bavêje, wî bi daxuyaniyên xwe wekî ku rê li ber hevdîtinan digire axivî. Dema ku hewlên ji bo şikandina vê rewşa bêçareseriyê didomin, bûyerên Siwêdayê derketin holê.

Êrîş û komkujiyên Siwêydayê, digel plana qirkirina Durzîyan, ji gelek derdoran, di nav de DYA, rexne li wan hatin kirin. Îsraîlê helwestek zelal girt û destwerdana leşkerî kir. Ev yek li Ewropa û Kongreya DYA bi fikar û gumanan re rû bi rû ma. Wan fêm kir ku hewldanên ji bo kedîkirin û rewakirina HTŞ’ê dê wekî ku hatiye plankirin rêve neçe. Ji ber vê yekê, xuya bû ku ew dipejirînin ku Rêveberiya Xweser hêz û modêla herî guncaw li Sûriyê ye. Lê, Tirkiyeyê bi tevahî piştgiriya xwe ji bona HTŞ’ê domand. Wê heta komkujiyên li dijî Durzî û Elewiyan jî şermezar nekir. Erdogan dît ku rewş li dijî HTŞ’ê dizivire. Wekî din, hate ragihandin ku dê li Parîsê di navbera QSD, Rêveberiya Xweser û hikûmeta Şamê de hevdîtin werin kirin. Piştre hikûmeta Tirkiyê gav avêt. Ji aliyekî ve, gef li rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwar û ji aliyê din ve jî nexwest ku rayedarên Şamê di bin van mercan de biçe Parîsê. Ji ber vê yekê, civîna ku ji bo 25’ê Tîrmehê hatibû plankirin hate taloqkirin.

Piştî ku civîna Şamê hate paşxistin, bi rêya DYA, di navbera Sûriye û Îsraîlê de hevdîtin hatin hêsankirin. Civînek di navbera Fransa, DYA û hikûmeya Şamê de hate sepandin. Eşkere ye ku ev hevdîtine, ne bê xeberê Tirkiyê bû. Wan hewl da ku ji DYA û Fransayê misogeriyê bistînin û dûv re Sûriyê neçar bikin ku li ser maseya danûstandinan rûne. HTŞ’ê dê dîsa bibe hikûmeta navendî û yekîtî û serweriya dewletê dê were naskirin! Ev daxuyanî wekî encamên vê civîna sêalî hatin eşkerekirin. Ev bi qasî daxwazên Tirkiyê ne, ewqas jî yên HTŞ’ê ne. Dema ku van daxwazan ferz dikir, Tirkiyê gefên xwe yên li dijî Kurdan û Rêveberiya Xweser zêde kir da ku destê HTŞ’ê xurt bike. Berî her tiştî, Tirkiye dixwaze Kurdan û Rêveberiya Xweser bêçek bike. Ev tê wê wateyê ku gel bêparastin dimîne. Di demekê de ku li Sûriyê komkujî diqewimin û ewlehiya kesî tune ye, bêçekkirina Kurdan tê wateya hiştina wan ji bo qirkirinê. Tirkiye îdia dike ku ewlehiya wê ji bo wê pêşîn e, lê ji bilî vê yekê tu gefên komkujiyê tine ye. Artêşeke wê ya mezin heye û li ser sînorên xwe tedbîrên tund girtine. Wekî din, Kurd ne hêzek e ku li benda fersendê ye ku êrîşî Tirkiyê bike. Berevajî vê, Kurd her tim rastî êrîşan hatine. Tirkiye hat û herêmên Kurdan dagir kir, gel neçar kir ku ji axa xwe koçber bibin.

Di 10’ê Adarê de, di navbera Şam û Rêveberiya Xweser de peymanek ji bo lihevkirinê hat îmzekirin. Li hev kirin ku QSD û herêm dê bi dewletê ve werin entegrekirin. Bi gotineke din, Kurd, Ereb û gelê herêmê dewletek cuda naxwazin. Tiştê ku ew dixwazin Sûriyekê nenavendî û demokratîk e. Ew dibêjin, “Em zêdetirî 10 salan e xwe birêve dibin, em rêxistinkirî ne û divê em van destkeftiyan winda nekin.” Ew artêşek cuda jî naxwazin. Ew dixwazin ku hêza leşkerî ya heyî bi artêşa Sûriyê ve were entegrekirin, ango bibe beşek ji wê. Ew naxwazin ku ew were hilweşandin, li cihê ku lê maye bixebite û ji bo parastina gelê xwe çareserî were peyda kirin. Çima xwesteka gel a parastina cewherî nayê pejirandin? Gel baweriya xwe bi komên girêdayî HTŞ’ê, bermahiyên El Qaîdê û DAIŞ’ê nayne. Ew li ber çavên cîhanê komkujiyan dikin. Wekî din, gel ne tenê niha, lê di salên şerê navxweyî de van hêzan nas dike. Wan şahidiya kiryarên wan kiriye. DYA û endamên din yên Hevpeymana Navdewletî ji tiştên ku li Sûriyê diqewimin bêxeber nînin. Ew jî li qadê bûn. Ew baş dizanin kî çi dike. Ger bi rast tevbigerin, ew ê gel radestî wan nekin. Lê, peywendî û danûstandinên navbera dewletan li ser bingeha berjewendiyên takekesî ne. Li gorî pîvan, zagon û dadperweriyê nayê tevgerandin. Tirkiye, nûnertîya xwe ya NATO’yê bikar tîne, bi DYA û hêzên din re li dijî Kurdan danûstandinan dike. Ew hewl dide ku Kurdan ji hemî pêvajoyan dûr bixe û rê li ber bidestxistina statûyê bigire. Pêşîniya herî girîng a Tirkiyê li Sûriyê ew e ku Kurdan ji statûyê bêpar bike û QSD’ê ji holê rake. Kurd û Rêveberiya Xweser jî dixwazin di Sûriyekê demokratîk de di nav aştî û biratiyê de bijîn. Ew ne tenê ji bo xwe û herêma xwe, lê ji bo hemî Sûriyê, bi taybet jî, ji bo jinan, azadiyê dixwazin.

## Li hember Rojava dijminatiya dîrokî



**Farûk Sakik**

Li Rojhilata Navîn çi biqewime bila biqewime, dewleta Tirk bi dijminatiya Rojava daxilî-tevlî vê pêvajoyê dibe. Israra dijminatiya Rojava bê navber dewam dike. HTŞ tê sorkirin, Hakan Fîdan gefan dixwe, rayedarên dewleta Tirk rêveberiya xweser wek dijmin îlan dikin. Bi belgeyên sexte dixwazin eşîrên Ereb li dijî Kurdan bixin nav liv û tevgerê. Zextan didin ser dewletên Ewrûpa-Fransa da ku pêşî li dîplomasiya Kurdan bigirin. Çi dibe? Çi diqewime? Ev dijmintî ji ku derê destpêkir? Ev dewleta ku li Tirkiyê bi Kurdan re li aştiyê digere, çima li Sûriyê li şer digere? Çima dixwaze Kurdan bêçek bike û bavêje nav lepên çeteyên hov. Nayê zanîn…

Hin şopên vê dijminatiyê, di destpêka avakirina komarê de jî tên dîtin. Meclisa Tirkiyê di 20’ê Cotmeha 1921’ê de, bi Fransiyan re sînorê xwe yên Sûriyê destnîşan kir. Diviya Rojava di nav tixûbên Tirkiyê de bimaya lê wan sînor danîn navbera Kurdan. Kurdên Rojava wê demê nerazîbûn nîşan dan. We demê serokê eşîra Okçû Îzzedînlî, Hannan Beg, di Adara 1922’yan de hat Enqerê belavokek li parlementerên demê belav kir û xwest Rojava bi Tirkiyê re bimîne. Daxwaza wî ji aliyê Erdogan û Hakan Fîdan ên wê demê ve nehat qebûlkirin.

Heman helwest dema Mûsil dane Îngilizan, Mebûsê Bedlisê Yusuf Ziya beg nîşan da û got; “Bi vê yekê we Kurd ji xwe dûr xistin.” Mijara me Rojava ye û em dewam bikin. Piştî bi Fransiyan re lihevkirin, bi peymana Enqerê mayîn û têlê rêsandîn sînorek danîn navbera malbat û eşîrên Kurdan. Nexwestin ew sînor bi tenê nivîskî bimîne. Fizîkî herdû alî ji hev qut kirin. (Sal derbas bûn fîlmekî Kemal Sûnal bi navê ‘propaganda’ hat çêkirin. Trajediya wê rojê destpêkirî bi awayek vekirî di vî fîlmî de me dît) Li hemberî van kiryaran Kurdan helwest nîşan da. Rêber Apo dema bi dewletê re muzekere da destpêkirin, statuya Rojava, rakirina sînorên dijminatiyê esas girt û got ‘Rojava, xeta min a sor e.’

Rêber Apo ji bo parastina Rojava gelek tavîzan jî dide. Dixwaze dewleta Tirk a îro bersiv bide belavoka Hanan Beg ya 104 sal berê. Tirkiyê bersiv neda pir tişt wenda kir. Bi qasî Kurdan wan jî gelek zirar dît. Tirkiyeya îro ji ber gumanên hêzên hegemon, midaxleyî Sûriyê nake. Rewşa Sûriyê wek statuya xwe dibîne. Erdogan, desthilata xwe, paşeroja xwe, bi Sûriyyê ve girêdaye. Ditirse sîstema konfederalîzma demokratîk li Sûriyê pêş keve. Dixwazin li ser hikumeta Şamê ya demkî re li Rojhilata Navîn bibe xwedî statuyek. Heger Colanî li Şamê dîktatoriya xwe îlan neke, ev yek wê bibe dawiya wî jî. Di qada navneteweyî de jî midaxelekirina vê heremê dest pê kiriye. Li Fransa û li hin deverên din civîn û hevdîtin hebûn. Ji ber van sedeman ku Hakan Fîdan di van rojên dawî de êrişkar bûye û gefan li Kurdan dixwe. Kî û kîjan hêzên demokrat, pirsgirêkan bi tenê li ser Kurdan de bide nîqaşkirin wê winda bike. Heger Kurd wenda bikin ew hêzên derdorê yên pêdivî bi demokrasiyê tînin jî wê winda bikin. Li Sûriyê, tîfaqa Kurd, Ereb û gelên din, bi sîstema konfederalîzma demokratîk tên çareserkirin. Tirkiye jî heger sînorê sala 1921’ê rake û vegere kodên hevkariya Kurd û Tirkan berî vê dîrokê, wê pêşî li hemû erîşên ber bi Tirkiyê birêketine, bigire. Ka îsal dema pêvajoya ‘Aştî û civata demokratîk’ dest pê kir we digot, em ê vegerin hevkariya Kurd û Tirkan a 100 sal berê!!!